في الغالب، تخلّت واشنطن عن تصوّراتها لإنهاء الحرب بطريقة الزحف البرّي، فالحرب وفق الخط البياني لها لن تكون برية أو بحاجة لتداخل جراحي عسكري على الأرض، سواء كان تدخّلاً مباشراً أم عبر الحلفاء. وهنا تتناقض أهمية الاعتماد على الأحزاب الكردستانية المؤتلفة في شباط/فبراير الماضي، خاصة وأن تلك الأحزاب طالبت بسلسلة ضمانات من بينها تأمين غطاء جوّي وتزويدها بالأسلحة الثقيلة والمدرّبين وفتح أفق التعاون مع واشنطن ليصبح سياسياً ولا يقتصر على الدعم العسكري واللوجستي. بهذا المعنى، لم تعد كردستان الأرض الأثيرة التي يمكن أن تبدأ منها عملية إسقاط النظام الإيراني، وهو ما لم تعد تفضله القوى الكردستانية أيضاً لخشيتها من جملة نتائج كارثية من بينها أنها ستصبح وفق هذا الشكل "عدوّاً داخلياً" متعاوناً مع الخارج ويعمل بدلالته القومية وبدون غطاء وطني معارض، وكل ذلك في ظل عداء إقليمي لفكرة إعادة تشكيل النظام السياسي الإيراني على أسس فيدرالية.

المصدر: المركز الكردي للدراسات

Sed silav li giyanê Bavê Felek

Hunermendê Kurd mamoste Mihemed Şêxo, di 37 emîn salvegera mirina xwe de tê bibîranîn. Hunermendê ku gelek êş kişand û li gel van êşên xwe êş û kederên welatê xwe, herwiha hesreta xwe ya welatekî Azad di stranên xwe de anîn ziman, îro di dilê nifşên nû yên Rojavayê Kurdistanê de zindî dibe. Mihemed Şêxo ku di dilê hemû Kurdan de cihê xwe girtiye, di sala 1948'an de li gundê Girbawiyê girêdayî bajarê Qamişlo ji dayik bû ye. Navê wî Mihemed Salihê Şêxmûsê Ehmed e. Di zarokatiya wî de malbata wî koçber dibe û li gundê Xecokê bi cih dibe. Di sala 1959´an de dest bi xwendinê dike, lê di sala 1967'an de, ji ber sedemên abûrî û êşa çavên xwe dest ji xwendinê berdide. Şêxo di nava xwîşk û birayên xwe de yê herî mezin bû, Lewre bi bavê xwe re karê cotariyê dikir û di nava zeviyên pembo û baxçeyan de dixebitî. Di salên xwe yên dibistanê de Mihemed Şêxo gelek hunermendên Kurd nas dike û di bin bandora wan de dimîne. Di sala 1969'an de dest bi dengbêjiyê dike û bi dengbêjan re tevlî şevbihêrkan dibe. Di dawiya sala 1969'an de diçe paytexta Lubnanê Beyrutê û di sala 1972'yan de dibe endamê Hevgirtina Hunermendên Lubnanê. Li wir hunermendên ereb ên wekî Feyrûz , Wedîh Elsafî û Asî Rehbanî nas dike. Li Beyrûdê 2 salan waneyên muzîkê werdigire û demekê di nava koma muzîkê ya bi nave Serkeft de cîh digire. Di sala 1972'yan de vedigere Rojavayê Kurdistanê û bi çend hevalên xwe re komek muzîkê ava dike û tevlî şahî û pîrozbahiyên Newrozan dibe. Êdî hêdî hêdî navê Şêxo di nava gel de belav dibe. Şêxo ji ber rejîmê di dawiya sala 1972'yan de diçe Başûrê Kurdistanê û ji wir jî diçe Bexdayê. Strana xwe ya yekemîn a bi nave "Baxçê Gula" li wir çêdike. Mihemed Şêxo piştre dîsa vedigere Qamişlo, lê rastî gelek astengiyên dijwar tê , û ji aliyê rejîmê ve tê girtin. Piştî peymana Cezayîrê û têkçûna serhildana Kurdan, Şêxo jî diçe Rojhilatê Kurdistanê û piştî ku demekê li kampa penaberan dimîne, li Mihabadê bicih dibe. Li wir fêrî zimanê farisî dibe, Lê xebatên xwe yên mûzîk û welatparêziyê jî didomîne. Li Urmiye û Mihabadê li ser şopa Qazî Mihemed xebata xwe dimeşîne, Lewre piştî Du salan ji aliyê rejîma Îranê ve sirgunî parêzgeha Ostanê Mazenderan tê kirin. Hunermend Mihemed Şêxo ku di 1983'yan de vedigere Qamişlo, di sala 1987'an de, tomargehekê vedike, lê rêjîm alavên wî hemû desteser dike. Şêxo li Qamişlo li navendek hunerî zarok û xortan hînî mûzîk û sitranan dike. Bi taybetî sitranên gelêrî û sirûdên netewî û welatparêziyê fêr dike. Mamoste Mihemed Şêxo di 9'ê Adara sala 1989'an de di 41 saliya xwe de çû ser dilovaniya xwe. Sed silav li giyanê te Ey hunermendê xebatkar û cefakêş Bavê Felek namire wê herdem di dil û hişê mede bijî

Danhev : Desteya Sernivîser a Rojnameya Pêşverû

Diyarî ji bo xwendevanan

Pêşverû

Ey Newroz

Ey Newroz Ey Newroz
tu li gelê Arî pîroz
Dema heyva Adarê
Li destpêka Buharê
Gul û gulçîn kemlîn,
şax û deşt tev xemlîn
Gelêm cejna we bixêr be
li her derê pîroz be
Cejna Newroz dîsa hat
weke rojê li me hilat
Li çiyan û li baniyan
agirê Newroz tê dadan
Ev agirê rizgarî
li Kurdistan dibarî
Nîşana cejna Newroz
gelê me li we pîroz
Dema Newroz tunebû,
gelê Arî bindest bû
Dehakê hovê xwînxwar
mêjikê mirovan dixwar
Dijî vê zulma giran
şoreşek bi şerf dan
Gel û Kaweyê Hesinkar
Newroz ji bo me kir diyar
Armanca pîroziyê ji bo serefiraziyê
Newrozek nû lidarxin,
gelê bindest pê şakin
Li ser xakê Kurdistanê
bidin kana û jiyan
Bi rindî û xweşî û dîlan
em şên bikin Kurdistan

****

Newroza 2638 an li we pîroz be xwendevanên hêja

Bijî xebata gelê kurd

Her bijî Kurd û Kurdistan

Desteya Sernivîser a Pêşverû

Dûmahî: Bîranîna 121 saliya rojbûna serkirde û ronakbîr Apê Osman

Ji ber wê yekê jî, Apê Osman di 24-12-1929`an de, derbasî nav axa Rojavayê Kurdistanê û Sûriyê bû, û piştre jî, dest bi berdewamkirina kar û xebata xwe ya nîştimanperwerî kir û ji Partiya Xoybûnê daxwaza endamtiyê kir û ji ber çalakiyên wî, ew yekser hat pejirandin û bi awayekî çalak kete nava xebata Xoybûnê, du salan bû endamê Partiya Xoybûnê û di kovara Hawarê da li ser mijarên cihê dest bi nivîsandinê kir. Pir helbestên wî hatine çapkirin û yên ne çapkirî jî hene.

Her weha piştî ku li gor agahiyên ronakbîrê gelê Kurd yê navdar MÎRHEM YÎGÎT ku Sala 1929'an 24'ê meha 12'an Apê Osman Sebrî dadikeve jêr, binxet dibe, derbasî wî aliyê sînor, xeta Frensawî dibe. Ew ne siyasetmedarê ewil û ne jî yê bi tenê ye ji Bakur derketiye.

Gelek law û keçên ji Dêrsimê, Çewlikê, Amedê, ji Wanê, ji Stenbol û her aliyê perçê Serxetê, rewşenbîrên wek Nûredîn Dêrsimî, zarwên mala Cemîl Paşa, yên malbata Bedirxaniyan, ji Mala Eliyê Ûnis Qewmê Çiyê, kesayetiyên wek Nûreddîn Zaza, Doktor Nafiz, Qedrîcan, Cegerxwîn, Hesen Hişyar û bi sedan têkoşer ji hejmarek niwêner û endamên rêxistin, komele û saziyên çendrengî li perçê em îro jê re dibêjin Rojava kom bûne. Ji bo salên ji vê sala binxetbûna Apê Osman û pêde jî binavkirina qonaxa sêhemîn wê ne şaş be. Berî Apê Osman perçê Bakur bughere bi du salan, Kurdên penaber û derketî, bi navê Xoybûn rêxistinek avakirine. Li gora lêkolînerên mîna Rohat Alakom rêxistina ewil ya mirov dikare jê re bêje hemdem. Apê Osman dibe endamê Xoybûnê.

***Derbarê berhemên Apê Osman Sebrî de….**

1- Elîfbêya Kurdî /1954 / Şam . 2 - Bahoz / helbest / 1956/ Şam . 3 - Derdên me / gotar û çîrok / 1956 / Şam . 4- Gotinên xav napijin bê tav / helbest / 1981/ Almanya / , helbestên vê dîwanê hêja Hemereş Reşo ji kovarên Hawar û Ronahiyê daye hev û pêşgotina xwe û pêşgotina Dr.Nûredîn Zaza çapkir . 5- Elîfbêya Tekûz / 1982 / Şam . 6- Çar Leheng / têkest / 1984 / Şam . 7- Berseva Hoşeng / 1992 / Şam .

Li sala 1957ê Apê Osman digel hin rewşenbîr û ronakbîrên welatparêzên Kurdên Rojavayê Kurdistanê, di xebata damezirandina Partiya Demokrat a Kurdî li Sûriyeyê de cih girt û ew xwedî bîr û baweriya wê damezrandinê bû, piştî ragihandina wê partiyê, ew wekî sekreterê partiyê hat hilbijartin û di bin sêbera wê partiyê de, Apê Osman dest bi kar û xebatê siyasî kir.

Lê piştî demeke dirêj ku êdî destê rêjîmên Sûriye kete nava Partiya Demokrat a Kurd li Sûriyê, Apê Osman digel çend hevalên xwe tê girtin û rewşa wan aloz dibe û bi taybet piştî ku hinek ji hevalên wî vîna xwe radestî rêjîmê kirin û teslîm bûn û dest ji dirûşmên serbixweyî û azadiya Kurdistanê berdan û dest bi perçekirina partiyê kirin û êdî partî bû bi sê û çar û heya roja me îro jî bû bi 30 partî.

*Panorameyek ji jiyana Apê Osman…

Di nivîseke lêkolînerî yê ronakbîrê gelê Kurd rêzdar MÎRHEM YÎGÎT de, wiha wek panorameyek nivîsiye;

Salên ewil Apê Osman çend caran derdikeve Bakur û davêje ser qereqolên dewleta Kemalîstî. Bi dû çalakiyeke wiha de dewleta Fransa Apê Osman û Kurê wî sorgonî Madagaskarê dike.

Salên bi dû şikestina serhildana Agirî de diçe Başûrê welat, li wir tê girtin û dikeve zîndanên Mûsil û Bexdê, sal 1931 e.

Salên di nav 1930-1940'an de li ser dîrok, sosyolojî û çanda Kurdan kûr dibe. Ji kovarên Hewar, Ronahî û Roja Nû re dinîvisîne, analîzên civakî dike û helbestên her yek ji wan mîna bang û mesajeke neteweyî ye diweşîne.

Osman Sebrî di sala 1944'an cara duwemîn dizewice, zewaca vê carê bi xanimeke esilçerkez re ye. Ji vê jinê jî bi navê Hoşeng, Hoşîn, Heval, Hingur û Hêvî; 3 kur û 2 keçên wan çêdibin. Kebaniya wî ya duhem û dawî sala 1986 an diçe ser dilovaniya xwe. Ji Zarwên wî Hoşeng li Berlînê, Hoşîn û ne şaş bim du xwişkên xwe Hingur û Hêvî li Siwêdê dimînin.

Di salên 1950 de ji bo damezrandina partiyeke Kurd dixebite. Ev xebat encam dide û sala 1957'an ew, Dr. Nûredîn Zaza, Reşîd Hemo û Hemîdê Derwêş Partiya Demokrat a Kurdî li Sûriyeyê ava dikin û bi xwe dibe serokê wê. Salên 1965-1969'an sekreterê heman partiyê ye, Sala 1971'ê ji vê partiyê istîfa dike û xwe bi temamî dide ziman û wêjeya Kurdî. Êdî Apo heta sala koça xwe ya dawî ji siyaseta aktîv dûr dikeve, di van salan de ji kovarên mîna Çiya, Hêvî û Armanc ku li Ewropa derdikevin re dinîvisîne. / Bîraînên Osman Sebrî, Aram 2004 Stenbol/

Çend berhemên Apo: Çar Leheng-1984, Apo- Elmanya, Dîwan-Hemreş Reşo, Bahoz û çend nivîsarên din-1956 Şam, Derdên me -957 Sûriye, Gotar û Helbest, Elîfbêya Kurdî-1954,Elîfbêya Tekûz-1982 Stokholm.

*Dawiya jiyana rêberekî gelê xwe…

Lê piştî ewqas kar û xebat û tekoşîna bê wêne, di roja 11ê çileyê paşîna sala 1993`an de, li bajarê Şamê Paytexta Sûriyê koça dawî kir û ji nav gelê xwe bar kir. Her weha bi marasîmeke mezin û gersayî, termê nemir Apo ji Şamê anîn bo Kantona Cezîrê û li gundê Berkevirê ya Rojavaya Kurdistanê sipartin bi axa welat.

Nivîskar : Hozan Efrînî

Bîranîna 121 saliya rojbûna serkirde û ronakbîr Apê Osman

Îro roja duşemê 5-1-2026`an e, ku di wê rojê de, beriya 121 salan, rojbûna ronakbîr û serkirde û rêberekî kêrhatî kurd Apê Osman Sebrî ye.
121 salên beriya niha , kesayetiyeke navdar û ronakbîr û helbestvan û damezrevanê Partiya Demokrat a Kurd li Sûriyê Apê Osman Sebrî hatiye dinê û bû bi stêrkek ji stêrkên ezmana Welatê Rojê. Di sala 5-1 1905`an li semsûrê, ya Bakurê Kurdistanê, Apê Osman Sebrî çavên xwe ji dunyayê re vekirin û roniya xwe da ser ax û baya welatê Rojê û bû yek ji diyartitîn stêrka azadiya doza rewa ya gelê Kurd û Kurdistanê.
Nemir Osman Sebrî ku ji aliyê gelê Kurd ve bi (Apo) dihate naskirin di roja 5-1-1905 ku li gundê Narincê ya Kolik a Semsûr a Bakurê Kurdistanê hatibû dinê û gelek xebat û lebat ji bo derxistina rastiya doza gelê Kurd pêşxistibû, Ew yek ji helbestvanên mezin ên gelê Kurd e. Di heman demê de, ew yek ji nivîskarên Rêbaza Hawarê û mamosteyê zimanê Kurdî bû.

Apê Osman Sebrî di deh saliya xwe de, ango di sala 1915` an de, ji ber koça dawî ya bavê wî, ew sêwî dimîne. Û piştre dayika Apê Osman Sebrî, (Emîne) bi apê wî yê bi navê Şukrî yê ku begê êla Mirdesî bû hevjîniyê pêktîne. Mirdêsa di nav bajarên Meletî, Riha, Siwêrek û Semsûrê de ye, Her weha piştî hevjîntiya dayîka Apê Osman bi Apê Şûkrî re, Apê Osman digel dayîk û Apê xwe dimîne, lê weke tê gotin ku Apê Şukrî cih û meqamê Apê Osman pir bilind kiribû, ji zarokên xwe pirtir, ji Apê Osman Sebrî hez dikir û bi awayekî cuda perwerde dikir û him jî ji tiştên ne cûr diparêzt û xwedî lê derdiket.
Her di dema xwendinê de jî, ew şande dibistanê û wî di 16 saliyê de, dike xwedî mal û hevjîn û dibe xwedî malbat. Her weha di hevjîntiya wî ya yekemîn, 3 lawên xwe bûn, 2 law ji wan 3 lawan zûh mirin, lê lawê Apê Osman yê sisiê jî, ku navê wî Welat bû, di destpêka sala 1970`ê de, li Bakurê Kurdistanê, di temenê 47 salî de, hat kuştin.
Her li gor rastiyên jêderên dîroka wî ku Apê Osman ji serokên êla Mêrdêsî bû. her ji bilî wê jî, ew pardarî xebata rizgarîxwaza gelê xwe jî yê li her çar aliyên Kurdistanê bû. Ne zehmet û ne jî astangî û ne jî mehalî li ba ferhenga wî tune bû, herdem digot; Di vê dinê de, tiştekî nebe nîne, eger mirov bixweze wê ji nebûnê hebûnê biafirîn e.
Derketina navbangê Apê Osman bi serhildana Şê Seîdê Pîran re…
Piştî Raperîn û Serhildana nemirê doza Kurd û Kurdistanê, bavê Kal Şêx Seîdê Pîran yê Palo, ku bi dar û agir û hesin hat serkotkirin û komkujî û kavilkirin bi derheqê gelê Kurd hat kirin û bi hemû awayekî ew serhildana Pîroz jinavbirin, Osman jî digel herdu apên wî Şukrî û Nûrî li sala 1926an de, ji aliyê leşkerên Tirko ve hatibûn girtin û piştre herdu apên nemir Apê Osman li zîndana Amedê bi awayekî hovane û dûr li hemû pîvan û yasa û zagonên cîhanê hatin darvekirin. lê di wê derê de, Apê Osman bi qasî du salan di zindana Denisliyê ya Amedê de ma û piştî ku lêborîneke giştî ji aliyê rêjîma Tirko ve hat dayîn, di sala 1928an de, Apê Osman hat berdan.
Di malpera Rewanbejê de li ser çawaniya destpêkirina tekoşîna netewaî ya ji aliyê Apê Osman ve destpê kiriye, Apê Osman Sebrî di bîranînên xwe de, buyera bidarvekirina apê xwe tîne ser ziman û dibêje;
“Me dengê lingê leşkeran bihîst û me xwe da hev. Demhijmêr nihê şevê bû. Bi lezgînî min destên apên xwe ramusand. Dema ew birin sêdarê li pişt wan min li wan nihêrî. Min dengê apê xwe carekî dîtir bihîst:
“Egid be, dirust be, pêgihiştî be û dema gihiştî dawiya rêkê azad û serfiraz be.”
Ji wira derketim û rasterast çûme nav cihê xwe. Barekî

mezin min girtibû ser milên xwe. Komarê dest danîbû ser tavayî mal û milkên me, paşê jî apên min kuştibûn. Wekî ku ji mezinekî rêber bêpar mabûm berpirsiyariya şazde zarokên ku pêdiviya wan bi xwedîkirinê heye kete ser şanê min. Berî bi deh salan dema ku min bavê xwe winda kirî apê min Şikrî tunebûna wî bi min nedabû hesandin. Gelê minê jî wekî wî li van zarokan baş mezyandibane? Di bin giraniya hizrên xwe de ser xwe çûbûm. Dema sibêda paşê rabûm roj derketibû”…
Her weha piştî ku Apê Osman di nava gelê xwe de, bi ciwanekî şoreşger û xwedî însiyetîv û pir çalakvan hat naskirin, di sala 1929`an de, careke din ew û 26 serkirde û berpirsên Kurd ji aliyê rêjîma Tirko ve hat xwestin û di encamê de, biryara girtina wan kirin bi fermaneke fermî û bi awayekî hovane yek bi yek xistin bin çavan û birin zîndanê, lê ji ber biçûkbûna temenê wî, ew dîsan azad kirin, lê herdem li jêr çavan û kontirola leşker û Cendirme û Mîtê de bû û car caran gef û hereşe lê dikirin û rê ne didanê ku bi şêwazeke çalak kar û xebatên Kurdeyetiyê bike û ji ber xwîna wî ya gerim, ew neçar bû ku dest ji Bakurê Kurdistanê berde û berê xwe bide Rojavayê Kurdistanê tako bi awayekî azad û serbest xebat û lebata netewî berdewam bike.
***Derbasbûna Apê Osman ji Bakur bo Rojavayê Kurdistanê…**

Rûpel 12

Dûmahî : Dr.Ebdilmecît Şêxo : Rola Kovara (Hêviya Welêt) (1963-1965)Z. xelek: 3

Xeleka dawiyê ye

xwedan û eger di destên xwedanmaf de dar û çek tune be,yanê ew rêya mirinê ye **û em** tucarî jî Kurdistanê nabînin .
(Dibêjin wefdeke Kurdî
Li ser zînat û sitemkariya Ecem
Nivîsareke dûr û dirêj
Li parîsê daye
sekretêrê (Heyata Umem)
Çêla biserhatiya Kurdên ciwanrû
Ku hinde jê hatine kuştin ..
Ma kînga heq têtedayîn ..Ho?
Heke xwedî heq ne dest bi dar be
Qelsî reya mirin û wenda bûnê
Bê şer û gelş û qîrên û lêdan
Lingê me naçe nav axa Kurdistan
Ho .. xortê Kurdê hêja
Rabe bi merdî serî hilde
Di nava gelên cîhanê de
Tu tenê ma ye bê nav û nîşan û deng..

…….

Osman Sebrî di helbesta (Ho xort) de bi dengê bilind bang li xortên Kurdan dike û erkên welatperwerî li **ser milên** wan jî dibîne,lê ne tenê wisa,ew dixwaze ji xortên Kurdan re rasterast bêje:Hûn pêşengên gelê xwe ne û hêviya Kurdistanê bi we bilind e,ku hûn serkêşiya doza gelê xwe bi dilêrî ji bo serbestiyê bikin,lê peyrewî bi ramanên biyaniyan,gelê Kurd dê herdem bindest û kole bimîne û divê armanca miletê me yek be û rêzan û ramana me jî ji bo pêkanîna mafên netewî yek be.
Ho xortê Kurd
Pêşengê xebat
Hêviya welêt
Ji bo azadî
Bi ramanên xelkê
Li ser reya wan
Dê bibin bindest
Çavên xwe veke
Wek her carê
Neyî xapandin.
M.Bor di çîroka xwe (Diz û lawik) ya ku di Buharê de derbaz bûye wisa dibêje:Nîvî şevê derbaz bûye,lê tariyê rind perdên xwe li ser bajêr de berdabûn, çavan çav nedidît,tenê car li caran ji dûr ve dengê dîkekî,an jî qijîna pîpka payerên kolanan dihatin,lê xûşîna baranê jî çiqas xweş bû,eger helbestvanek li wê derê hebûya,ewî kanîbûya derbarê zulmetê de helbestek binivîsiya.Lê bûyerên vê çîrokê li Diyarbekirê (Amedê)derbaz dibin,diz dikarî di şevê de dîkanekê talan bike,lê di sibê de; divê ew biçe mizgeftê û Mela ji mizgeftê derdikeve û diçe ba jineke bi mêr,ev Diyarbekir bû,ew tijî çîrok û efsane bû.Kalemirovek hebû ,bi wî re digotin Apo,ew dizekî jêhatî bû,Memo zarokek bû,lê ew bûbû dostê apo,herduyan dizê dikirin,lê apo ew berdida hundir dîkanan taku ew diziyê bike,lê ew bi dizîbûna wî ne qayil e, ji ber ku ew biçûk e û nikane pir tiştan ji hundiran derxîne,apo girs û por spî bû,tariyê dîsan dorhêl vegirt û ji bo dizan fersendek baş bû,lê kalê me sud ji dizîyê nedîtibû,ewî dixwast bixebite,lê tukesî ew li nik xwe neda xebtandinê, ev kalemêra dîsan diziyê dike û li dawiya dawiyê ew li kolana Amedê têtekuştin.
Bi rastî;M. Bor vê çîrokê pir baş li tevnê dixîne, di vir de carna nêrînên hevdij,carna nêrîn û helwestên erênî têtin holê,di navbera kalemêrê me û civakê de hevkêşeyên ne dirust peyda dibûn, xûya ye; ne tenê mirov gola civakê diherîmîne,lê carna jî civak jî nizane mirovê xwe perwerde bike û çavên xwe li ser kêmkasî û şaşiyên borî damrîne û rûpeleke nûh ji serastkirinan re veke .
Wek di dîroka tevgera gelê Kurd di Rojavayê Kurdistanê de baş diyar e ku Dr.N.Zaza Siyasetmedarekî jêhatî û navdar bû,ew sekretêrê (Partî Dêmokrata Kurdistanê) li Rojavayê Kurdistanê bû,ewî jî mîna pir hevalên xwe di zîndanên dewleta Bas de pir lêdan û êş dîtibû,lewra ew direve
Libnanê,li vir Dr.N.Zaza serpêhatiyeke xwe di bin navnîşana (Şerê Mêşa) dirêse;Dr.N.Zaza (15) rojan jiyana xwe li mala Kurdekî belengaz derbaz dike,ew li wir demên xwe bi kuştina mêşan derbaz dike û ew li wir ji ber mêşan û girînên zarokan gelek bêhteng dibe,ew mêşên ku nedihêştin.

Dr.N.Zaza raze,mîna endamên partiya Bes li pêş wî dihatin xûyakirin.
Li dawiyê em kanin bi sanahî bêjin ku ev hersê hejmarên nirxbuha di bin navnîşana (Hêviya Welêt de) bi pênûsên gelek siyasetmedar û wêjevanên Kurdistanî roleke berçav di pêşketina tevgera rojnamegeriya Kurdî de lîstiye.

Xeleka dawiyê ye

Dr.Ebdilmecît Şêxo : Rola Kovara (Hêviya Welêt) (1963-1965)Z. xelek: 3

Di hejmara sêhem de em tenê kanin sê gotaran bixwînin;1-(Şoreşa Kurd û daxwaza awtonomî bo Kurdistana nîvro (Îrqa),Soro,2-(Kurdistan û serxwebûn3-Kronolojiya nivîskarên Kurd li Kurdistana Bakur) Hemreş Reşo.
Herwisa jî di vir de (9)helbest hatine weşandin;1-(Rojî reşî şeşî Eylû) Kemal Fuad,2-(helbestek bê navnîşan)Hejar,3-(Sewaş ji Xwedê re. 4-Xwrok.5 -Axa welat) Hemreş Reşo. 6-(Meşa Xorta Kurda,7-Newroz,8 -Hoşiya min) M.Bor. 9-(Ho xorto) Osman Sebrî.
Lê tenê di vir de serpêhatiyek di bin navnîşana (şerê mêşa de) bi pênûsa Dr.N.Zaza cihê xwe girtiye,herweha jî dîsan çîrokek di bin navnîşana (Diz û lawik) de bi pênûsa M.Bor de li tevnê ketiye.
Soro di gotara xwe (Şoreşa Kurd û daxwaza awtonomî bo Kurdistana nîvro de) li ser hin pirsgirêkan bi hurgilî radiweste;ew bi van wateyan dibêje:Ev bûye nêzîkî sê salan ku miletê me li dijî hukumeta xwînmij û keleş li Îraqê berevaniya xwe dike,bi hezaran ew bûne pakrewanê Kurdistanê û bi sedan gund hatine wêrankirin,lê pêşmergên qehreman bi pîdarî li hember karbidestên Îraqê radiwestin,lê gava partiya(Bes) bûye destlatdar,ewê soz dabû gelê Kurd ku daxwaza gel (awtonomî bo Kurdistanê û dêmoqratî bo Îraqê) bi cihûnin, mixabin li dewsa mafdayînê,ewê di Pûşpera,sala1963 an de êrişek dirinde û hovane bire ser Kurdistanê,lê Kurdan digotin:(Kurdistan yan neman!),lê piştî Selam hate ser textê Îraqê,carek din şer rawestiya û danûstandin di navbera Kurdan û hukumetê de dest pê kir,di encamê de çareserî ji kêşeya Kurdî re nehate kirin,şer sernûve dest pê kir,li dawiyê Soro gelek bi azadiya Kurd û Kurdistanê bawermend bû, ew nameyek ne rasterast ji destlatdara Besiyan re dişîne û dibêje:
(hukumet bi destên xwe gora xwe dikole).Em di vir de kanin bêjin ku Soro di nivîsîna xwe de pir serkeftî bû,ewî bi hemû awayî tovên geşbînê di dilên xwendekarên Kurdistanê de li dervayî welêt diçandin.
Lê sernivîserê kovarê Hemreş Reşo di gotara xwe (Kurdistan û serxwebûn de) li ser rewabûna damezrandina dewleta Kurdistanê serbixwe dipeyive û ew dibêje:Di sedsalên me de nema kes bi galgalan,baweriyên bê zanistî û tarî înan bike û têkoşînê ji ber wê da bike,lê ev sedsala dema rastî û şiyarbûna gelan e.Gotarnivîs mercên gelbûnê bi xwendevanên xwe dide nasîn û dibêje:Di vî sedsalê me de,divê bi tenê ew gelê ku di welatekî de dijî,bi dîrokek kevin bi hev ve hatibin girêdan,ew kesên wî gelî bi dilsozî bixwazin bi hev re bijîn û pêşve biçin,gava ev mercên jorî di gelekî de hate dîtin,ew wek gelekî tête naskirin û gava dewlemendiya welêt jî têrî wan kir,serxwebûn dibe mafê wan.Hemreş Reşo hîn dibêje:Emê karibin gelên din bawerkirin bidin ku nema gelê Kurdistanê bê serxwebûn û girtina mafên xwe dikare bêdeng bisekine û destên xwe li ber neyar û gelên din mîna parsokan verge,ji ber ku hemû mercên gel û netewayetiyê cem Kurdan hene, bi hezaran xort û keçên me di şoreşên Agirî,Dêrsim û niha jî sê salên li Kurdistanê xwîn tête rijandin.Herweha Hemreş

Reşo dewlemendiya Kurdistanê bi herdu çemên navdar (Dicle û Feratê)jî di ber çavên xwendevanên xwe re derbaz dike,lewra ew serxwebûna Kurdistanê mafekî rewa dibîne û bi vî awayî; nivîskar çirek geş di hişên xwendkarên Kurd de li Ewropa vêdixe,lê ne tenê wisa,H.Reşo di vir de gelek helbestvanên Kurdistanê yên ku rolên xwe di pêşketina wêje û hestên netaweyetî de lîstine bi xwendekarên Kurd li Ewropa dide nasîn û ji wan ev in:1-Melayê Cizîrî.2-Elî Herîrî.3-Feqiyê Teyran .4-Melayê Batî .5-Şerefedîn Bitlîsî.6-Ehmedê Xanî û hin din .
Em tenê dixwazin li vir du malikên pir navdar yên helbestvan Hejar mîna zengileke dengdar di guhên xwendevanan de dikin hawar û qêrîn,ew dixwaze bi Kurdî bijî û bi Kurdî jî bimre û bi Kurdî jî here gorna xwe
(…..
Bi Kurdî ejîm,bi Kurdî emrim
Bi Kurdî edem weramî qebrim .
…).
Lê Osman Sebrî di helbesta (Wefda Kurdî) de û ya bi (144) malikên nîştimanperwerî û şoreşgerî hatine ristin û bi dengê bilind û zelal bang li gelê xwe dike û dibêje:Divê hûn li mafên xwe bibin xwedan û **eger di**

Rûpel 14

Dûmahî : Hişmend Şêxo : Di bîranîna (128) saliya Rojnameya Kurdistan û Rojnamegeriya Kurdî de

Roja 15'ê Gulana sala 1995'an çapemeniya kurdî li hemû parçeyên Kurdistanê dest bi pêngaveke din kir. Med TV bi wê logoya xwe ya rengîn , reng ji rengên xak û xwezaya Kurdistanê, bi sirûda netewî ya kurdî "Ey Reqîb" , bi wê muzîka balkêş û hişyarker dest bi kar û weşanê dikir û bi sed hezaran ji gelê me li ber rûdiniştin û temaşe dikirin.
Rûberê ku Med TV dabû ber xwe pir berfireh bû ji Ewropa bigire heya Bakurê Ifrîqiya û Rojhilata Navîn bû. Ronahî û ekrana wê ya tije helwestên wêrek , pirogramên wê yên dagirtî , xurtbûna pêşkêşvanên wê, deng û rengê hunermendên herî binav û deng , hevpeyvîna bi siyasetmedarên navdar û kesayetiyên kurdistanî re , rênas û dîrokzanên ku me tenê navên wan bihîstibûn û hinek ji berhemên wan xwendibûn me ev tev cara yekê bi rêya MED TV dîtin û naskirin.
Med tv yekem telefizyona kurdî pêngav û şoreşek modêrn bû di jiyana gelê me de.
Piştre gelek Telefizyonên kurdî çêbûn wek : Kurdistan Tv , Kurdsat , Gelî Kurdistan , Rûdaw , Kurdistan24 , Tîşk Tv , Rohilat , Cemawer û hwd.
Piştî ku bayê guherînê li Rojhilata Navîn da û derbasî Sûriyê bû rewşa gelê kurd li Rojavayê Kurdistanê bi tevahî hat guhertin û ji hemû aliyan ve derbas qûnaxeke nû bû , û li ser asta çapemeniyê jî xebatek ragihandinî hêja hate kirin û gelek rojname û kovar bi derketin , herwiha gelek radiyo û tv bi rêketin wek : Dengê Efrînê , Dengê Pêşverû , Dengê Mîştenûr , Ronahî tv hewd..
Beşdarên berêz Rojnamegerî pîşeyeke dijware, û îro li seranserî cîhanê kesên ku herî zêde rastî tundiyê tên medyekar û rojnamevan in , û bi taybetî jî rojnamevanên kurd in.
Lê mixabin piştî (128) salan ji weşana yekem rojnameya kurdî "Kurdistan" û digel pêşketina şoreşa pêgihînê û toreyên civakî ji Radiyo , Tv û medya û malperên cihêreng tê xuyakirin ku çapemeniya kurdî hîn dîlê gilî û gazina ye û gelek caran dûrî şêwazên zanistî û dahûrandinê ye , û lêkolîn û zanistên nûjen têde kêmin , ev jî ji encama tunebûna pirojeyek ragihandinî yekgirtî li ser bingeha dîtin û bernameyên siyasî ye , herwiha ji ber tunebûna navendên lêkolînan û kesên pisporin.
Di vê çarçewê de gelek çewtî di karê ragihandinî de bûye û ciyê mixabiniyê ye ku di gelek qûnaxan de dilsozî û wefadariya ji kesayetiyan re di pêşiya dilsozî û girêdana bi kurdayetîyê re bûye.
ji ber vê yekê dema ku karê rojnamegeriyê bê sîstem û piroje be dê bandoreke neyênî li ser doza kurdî li her çar perçeyên kurdistanê bike , lewre ji dezgehên rojnamegerî , partiyên siyasî , pisporên ragihandinê , hişmend û rewşenbîrên kurd tê xwestin ku li ser vê kêşeyê rawestin û hişiyarîyekê bidin civaka kurdî û hewl bidin ku saziyek ragihandinî kurdistanî bihêz ava bikin da ku hawara gelê kurd û rewabûna doza netewî ya kurdî bighînin dunyayê û bandorê di raya cîhanî de bikin ji bo piştgîriya doza kurdî ya dadmend.
Di dawiya vê waneyê de û bi helkefta (128) saliya Rojnameya Kurdistan ez germtirîn pîrozbahiyan arasteyî we û tevahî gelê xwe û hemû hevalên xwe yên rojnamevan dikim , Herwiha ez cejina hemû nivîskarên kurd pîroz dikim û hêviya min ewe ku xebat û tekoşîna malbata Bedirxaniyan bimîne ronahiyek di rêya xebata rojnamevanên kurd û rojnamegeriya kurdî de .
Silav li giyanê pêşengên ragihandina kurdî : Diktor Kamîran Bedirxan , Diktor Nûredîn Zaza , Apê Osman Sebrî , Rewşen Bedirxan , Qenatê Kurdo ,Hemreş Reşo , Diktor Kemal Mezher Ehmed , Diktor Izedîn Mistefa Resûl û Mamoste Cegerxwîn .
Silav li giyanê hersê rojnamevanên ciwan û hêja : Ferhad Çelebî , Rezoyê Osê , û mamoste Selah Berwarî
Sed silav li giyanê Mîr Miqdad Midhet Bedirxan
Pêşketin ji Ragihandina Kurdî re. Spas ji guhdariya we re..

Efrîn 22 / 4 / 2026 Z – 2638 K

Amedekar û wanevan : Hişmend Ebdilmenan Şêxo

****Endamê Komîta Navendî ya Partiya Demoqrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê***

Dûmahî : Hişmend Şêxo : Di bîranîna (128) saliya Rojnameya Kurdistan û Rojnamegeriya Kurdî de

çi dikin, çawa şer dikin, tîcaretê çawa dikin; ezê qala hemûyan bikim.

Rojnameya Kurdistan li serhev (31) hejmar derketin. Miqdat Midhet Bedirxan (5) hejmarên pêşîn derxistine, lê ji ber zordestiya dewleta Osmanî Miqdat Midhet Bedirxan nema karibû derxista , Piştre birayê wî Ebdilrehman Bedirxan rojnameyê berdewam dike. Ebdilrehman Bedirxan jî ji ber zilma dewleta Osmanî, piştî Qahîreyê, li Siwîsre û Îngilîstanê dest bi derxistina rojnameya Kurdistan kir. Rojnameya Kurdistan li ser hev 31 hejmarên wê derketin (Hejmar 1 di sala 1898an de - Hejmar 31 di sala 1902 an de).

Hejmarên 1'ê heya 5'an li Qahîreyê, hejmara 6'an heya 9'an li Cinêvê li Swîsrayê, hejmara 20'an heya 23'an dîsan jî li Qahîrayê, hejmara 24'an li Londonê, hejmara 25'an heya 29'an li Folkistona Başûrê Îngilîstanê û hejmara 30'î heya 31'ê careke din li Cinevê hatiye weşandin.

Di heyama 47 meh û 22 rojan de, di rewşeke dijwar de 31 hejmar hatine weşandin. Di 13'ê Nîsana 1909an de rojnameya «Kurdistan» ji aliyê Osmaniyan ve hate rawestandin.

Bi derketina rojnameyên kurdî re bîr û bawerî, zanîn û rewşenbîrî ya nûjen û hişyarbûna netewî ya kurdî dest pêkir.

Di vê derbarê de hêjayî gotinê ye ku li Kurdistana Sûriyê jî tevî astengî û çav soriya rêjîma Bes a şovînî li ser gelê kurd , Lê xebatek ragihandinî hêja hatiye kirin û gelek rojname û kovar bi zimanê kurdî hatine weşandin wek:

Hawar , Ronahî , Dengê Kurd , Dîmoqratî , Gulistan , Pêşeng , Rêya Rast , Kurdax , Zanîn , Nasname ,Pêşverû , Aso , Gelawêj ,Hêvî , Pirs , Newroz , Deng , Stêr , Xunav , Gurzek gul , Dengê Kurdistan , Sorgul , Leylan , Rewan , Roja Ciwan ,Pênûsa Zimên , Sîwan , Şermola , Lêkolînên istratîcîk û gelek rojnameyên din.

Hêjano ji ber çav sorî û hovîtiya dagîrker û zordestan gelek rojnamevanên kurd li her çar parçeyên Kurdistanê hatine zîndan kirin û kuştin , Di salên 90î de li Kurdistana Bakur, rojnamevanên paye bilind û navdar wek Mûsa Enter, Husên Deniz, Medet Serhat, Hafiz Akdemir û gelek rojnamevanên din ji aliyê dewleta Turkiyê ve hatine kuştin.

Beşdarên berêz qûnaxa Duwem ji xebata ragihandinê îzgeh û Radiyo bûn

Hêjano her di vê derbarê de hêjayî gotinê ye ku em keda û xebata radiyoya Êrîvanê bînin ziman.

Radyoya Êrîvanê beşê kurdî bi xebat û keftûleftên giran ên kesên wekî Heciyê Cindî, Emînê Evdal û Xelîl Muradov di sala 1955an de dest bi weşana xwe kir. Bi taybetî keda Xelîl Muradov hêjayî pesnê ye ji ber ku wî 24 salan (ji 1957an de heta 1981ê de) serokatiya radyoyê kiriye û hemû stiran , awaz û meqamên kurdî di dema wî de û bi serokatiya wî hatine qeydkirin.

Herwiha herdu îzgehên kurdî ya Qahîra û Bexdê di dema xwe de bi rolekî girîng radibûn.

Qûnaxa piştî wê xebata radiyoyên kurdî li Kurdistana Basûr destpêkir ku herdu partiyên sereke (PDK û YNKê) radiyoyên kurdî taybet bi mijarên rêzanî , partîzanî û şoreşgerî vekirin. Lewre Yekîtî Niştimanî Kurdistan di Çiriya pêşîn ji sala 1976an de karê xwe kir û ji ber tunebûna herêmeke aram tu cîgeh û navend ji îzgehê re tune bûn û heya bi sê salan veşartî bû û di / 20 / 3 / 1979an de di demjimêr Şeş bi êvarî îzgehê dest bi karê xwe kir û wisa digot:

Dengê Gelî Kurdistan.
Dengê Yekîtî Niştimanî Kurdistan.
هنا إذاعة صوت شعب كردستان. صوت الاتحاد الوطني الكردستاني.

Hêjano qûnaxa sêyem ji xebata ragihandinê desthilata ezmanî ya kurdî bû

Gotin û gengeşeyeke fireh li welêt û li derveyî welêt dihatin kirin ku wê telefizyoneke kurdî were vekirin. Ew nûçeya rojnameyek dirêj û tije pirsên bêbersiv bû, lê ew axaftin û pirsên xelkê yên rojane bûn destpêka jiyaneke nû , û di havîneke germ de bû aveke sar û têhina sed salan a vê xaka pîroz şikand.

Med TVê di 15ê Gulana 1995an de li Londinê dest bi weşana xwe kir. Med TVê rojane şeş demjimêran bi zimanên Kurdî, Tirkî, Asûrî û Erebî weşana xwe dikir û li Ewropa, Ifrîqiya Bakur û Rojhilata Navîn dihate temaşekirin. MED TVê bi vê yekê gaveke mezin di dîroka çapemeniya kurdî ya nûjen de avêt û sînorên di nav kurdan de bi rêyeke modêrn, bi rêya teknolojiyê **rakirin.**

Rûpel 16

Hişmend Şêxo : Di bîranîna (128) saliya Rojnameya Kurdistan û Rojnamegeriya Kurdî de

Ez vê gotarê diyarî we û hemû hevalên xwe yên rojnamevan dikim , herwiha ez diyarî hemû xwîner û hezkiriyên rojnamegeriya kurdî dikim.

Di serdema pêşketina şoreşa pêgihînê û Toreyên civakî de ragihandin bi rolekî pêşeng radibe di pêşxistina xebata gelan û Azadiya welatan de , Di heman demê de ez karim bêjim ku hemû Tevger , Partî , Komele û rêxistin bi nerîn û siyasetên rastbîn , helwestên wêrek û çalakbûna ragihandina xwe xurt û li pêşin , Lewre ragihandin şêweyê herî sereke ye di karê tevgera rêzanî û xebata demoqrat û aştiyane de.
Bê gûman rojnamegerî karekî giran û bi cefa ye ew karê cefakêşa ye û bi rolekî herî girîng di jiyana miletan de dilîze , ji ber ku herdem bi civakê re têkildare di weşandina zanîn , bûyer, çalakî , lêkolîn , rapor û hwd.
Rûpelên rojnameyan kevin , nû û siberojê bi hev de girêdide.
Bi kurtî em dikarin bêjin ku rojnamegerî rewşa jiyana her miletekî bi miletên din re dide nasîn û dibe deng û hawara gelên bindest.
Rojnamegerîya kurdî yek ji wan amûrên girîng û pêşeng e di xebata Tevgera Rizgarîxwaza Kurdistanê de, û bi taybetî rolekî wê berbiçav heye di pêşxistina ramanên gelê kurd de ku pêşketinên cîhanê digihîne civaka kurdî , lewre rojnamegeriya kurdî ji aliyê dagîrkerên kurdistanê de rastî gelek kelem û astengiyan hatiye.
Çapemenî wijdanê civakê ye ji ber ku bûyer û nûçeyan bi şêweyekî porofosînel , rastgo û pêwîst radigihîne, ji ber vê yekê Rojnameya Kurdistan hat holê, têde Miqdad bang li gelê kurd kiriye ku xwe bighînin zanistiyê û hawara gelê xwe bighînin dunyayê.

Rojnamevanên cefakêş :
Di 22 Nîsana 1898 an de û berî bi (128) salan Mîrê rojnamegeriya kurdî Miqdad Midhet Bedirxan li Qahîra li paytexta Misirê rojnameyekê bi zimanê kurdî bi navê rojnameya Kurdistan derdixe û dûrî xaka Kurdistanê li derveyî welêt belav dike..
weşandina Rojnameya Kurdistan ne tenê xebateke neteweyî û rewşenbîrî ye lê belê ew şoreşeke çandî bû di dîroka gelê kurd de. Û ji wê rojê de heya roja îro roja 22 yê Nîsanê hemû medyekar û dezgehên ragahandinên kurdî û tevahî gelê kurd li her çar parçeyên Kurdistanê û li derveyî welêt hersal vê rojê bi bîr tînin û pîroz dikin.
Di wê serdemê de rojnameya (Kurdistan) bi rolekî girîng radibû di gihandina zanyarî û bûyerên navçeyî , cîhanî û Kurdistanî de.
Mîrê rojnamegerîya Kurdî Miqdad Midhet Bedirxan di hejmara Yekê de û di rûpela destpêkê de ya rojnameya Kurdistan de wisa dibêje :
“Keyfa min têt ji Kurda re, kurd ji gelek qewma zêdetir xweyî hiş û zeka ne, camêrin, di dinê de rast û qewîn e. Xurtin û dîsa wek qewmên dî ne xwendan e, ne dewlmendin, di dinyayê de çi dibe wê çi bike nizanin. Loma riya Xwedê de min ev cerîdeya ha nivîsî, bi îzna Xwedê her pazdeh rojade carekê, ezê cerîdeyekê binivîsim. Navê wê min kiriye (KURDISTAN), vê cerîdeyê pêde ezê behsa qenciya ilim û me’arîfetê bikim, Heta niha kesî cerîdekî wiha ne nivîsiye, ev cerîdeya mina ha ya ewilî ye, loma wê gelek kêmayî hebin. Ez hêvî dikim kêmaya cerîdeyê ji min re binivîsin..
Herwiha Miqdad Midhet Bedirxan, bi xwe sedema weşandina rojnameyê wiha tîne zimên :
“Di dema me ya îroyîn de, êdî her tiştên ku li dinyayê diqewimin, ji hêla rojnameyan ve tên nivîsandin û ragihandin. Gelek tiştan em ji rojnameyan fêr dibin. Lê mixabin, kurd, ên ku hew çend wêrek, egîd û merd in, ji tiştekî wiha kêrhatî kêm mane. Ez jî vê rojnameyê derdixim da ku, we kurdan ji bûyerên dinyayê agahdar bikim, rêyên zanistî û merîfetê nîşanî we bidim û we teşwîqê nivsandin û xwendina kurdî bikim”…
Di vê rojnameyê de ezê qala qenciya zanyariyê û têgihîştinê bikim; li kuderê mirov fêr dibe, li kuderê xwendingeh û dibistanên qenc hene, ezê nîşanî kurdan bidim; li kuderê çi şer dibe, dewletên mezin çi

Rûpel 17

Li Efrînê heqaret li Alaya Kurdistanê hat kirin: Kurd rabûn ser pêyan

Îsal li Sûriyeyê cara yekem bû ku Newroz wekî cejneke nîştimanî û fermî dihat pîrozkirin.
Lê belê li Efrîna Rojavayê Kurdistanê rê li ber bilindkirina Alaya Kurdistanê hat girtin bêrêzî lê hat kirin û alozî derketin.
Li Efrînê û derdora wê di pîrozbahiyê Newrozê de li hemberî Kurdan binpêkarî hatin kirin.
Welatiyên Sûriyeyî û alîgirên hikûmetê rê neda ku Alaya Kurdistanê were bilindkirin.
Alaya Kurdistanê ji destê xelkê hat standin û bêrêzî li wan hat kirin.
Li gorî hinek vîdeoyên ku hatine belavkirin, li herêma Efrînê êrişî ciwanên Kurd tê kirin.
Di dîmenan de xuya dibe ku heqaret li ciwanan tê kirin û li wan dixin.
Her wiha hinek endamên berê yên komên çekdar heqaret li Alaya Kurdistanê jî kiriye.

Li Hesekê û Qamişloyê xwenîşandan

Kurdan ev kiryarên li Efrînê qebûl nekirin.
Li Hesekê û Qamişloyê Kurdan xwenîşandan kir û Alaya Kurdistanê bilind kir.
Şervanekî Kurd di xwenîşandanê de got, “Ev al Alaya me ya Kurdan e, bijî Kurd û bijî Kurdistan.”
Xwenîşanderekî Efrînî jî bertek nîşan da û got, “Alaya Kurdistanê dişewitînin, ciwanên me dikujin. Em ji hikûmeta demkî re dibêjin êdî bes e. Ez ji Efrînê me, 5 caran koçber bûme û ez venagerim.”

Helwesta rayedaran û daxuyaniyên fermî

Li Kobaniyê jî bûyera daxistina alaya Sûriyeyê çêbûbû.
Endamê Fermandariya Hêzên Sûriyeya Demokratîk (HSD) û Alîkarê Wezîrê Parastinê yê Sûriyeyê Semîr Elî Oso (Sîpan Hemo) ev bûyer wekî karekî takekesî bi nav kir.
Lê belê Ofîsa Parêzgeha Helebê ku Kobanî bi ser ve ye, tenê behsa bûyerên Kobaniyê kir û qet behsa rêgirtina li ber Alaya Kurdistanê ya li Efrînê nekir.
Li aliyê din, Nûnerê Taybet ê Serokatiya Sûriyeyê yê ji bo cîbicîkirina peymana 29ê Kanûna Paşîn Ehmed Hîlalî bangî hemû aliyan kir ku xwe aram bin.

Jêder : Rûdaw

Bi giyan û vîna Rojnameya Kurdistan Em xebata xwe dikin

Bi helkefta cejna Rojnamegeriya Kurdî Desteya sernivîser a Rojnameya Pêşverû cejna hemû Rojname , Kovar , Tv , Malperên Eliktironî û cejna tevahî medyekar û rojnamevanên Kurdistanê pîroz dike û serkeftinê ji xebata Rojnamegeriya Kurdî re dixwaze.

Pêşverû
Siyasî . Çandî . Gîştî

Desteya sernivîser a Rojnameya Pêşverû

Rojnameya Pêşverû Dengê miletê kurd e
Dengê Partiya Demoqrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê ye

Pêşverû

Siyasî . Çandî . Gîştî

کوردستان

Rojnameyeke Mehaneye ji Aliyê Nivîsgeha Ragahandina Efrînê ya Partiya Demoqrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê Tê weşandin Hejmar* (100) *Nîsan 2026 Z - 2638 K

Dengê Pêşverû

128 sal di ser Rojnameya Kurdistan re

Di 22 yê Nîsanê de her sal cejina rojnamegeriya kurdî li me dibe mêvan û bi hatina vê roja giran buha gelê kurd li her çar parçeyên Kurdistanê û li derveyî welêt vê cejinê pîroz dike.
*Di 22 Nîsana 1898an de û berî bi **128** salan mîrê rojnamegeriya kurdî Miqdad Midhet Bedirxan hejmara Yekem ji rojnameya Kurdistan derdixe ji bo bûyerên dunyayê bi kurdan bide agahdarkirin û wan fêrî zanistî û kurdperweriyê bike û êş û azarên gelê xwe bigihîne Cîhanê û bide naskirin.*
weşandina Rojnameya Kurdistan ne tenê xebateke netewî û rewşenbîrî ye lê belê ew rojname şoreşeke çandî bû di dîroka miletê kurd de,bi derketina rojnameyên kurdî re bîr û bawerî, zanîn û kultûra rewşenbîrî ya nûjen û hişyarbûna netewî li seranserî Kurdistanê dest pêkir. Di vê çarçewê de gelê kurd û tevgera netewî ya kurdî êş û azariyek mezin dîtine di berdewamiya rêveçûna karê rojnamegerî û ragihandina kurdî de.
Li Kurdistana Sûriyê jî tevî çavsoriya rêjîma Bes a şovînî li ser gelê kurd , Lê xebatek ragihandinî hêja hatiye kirin û gelek rojname û kovar bi Zimanê Kurdî hatine weşandin wek: Dengê Kurd , Dîmoqratî , Gulistan , Zanîn , Pêşverû , Aso , Gelawêj , Pirs , Newroz , Xunav , Stêr , Deng û gelek kovar û rojnameyên din.
Em di desteya sernivîser a Rojnameya Pêşverû de hemû rojname û kovarên kurdî û hemû rojnamevan û medyekarên kurd li Kurdistan û li derveyî welêt em wan pîroz dikin û em bejina xwe li hemberî pêşengên çapemeniya kurdî diçimînin û di serî de Mîr Miqdad Midhet Bedirxan ,Sed silav li giyanê Dr.Kamîran , Rewşen Bedirxan , Qenatê Kurdo ,Hemreş Reşo , Cegerxwîn .Sed silav li giyanê hersê rojnamevanên hêja: Ferhad Çelebî , Rezoyê Osê ,û Selah Berwarî.

22 / 4 / 2026 Z - 2638 K

Desteya Sernivîser a Rojnameya Pêşverû

Partiya Pêşverû pêşwaziya gelê xwe dike

Di 14 / 4 / 2026an de şandek ji Partiya Demoqrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê pêşwaziya gelê xwe kir ku piştî Heşt salan ew li bajarê xwe vedigerin.
Hêjayî gotinê ye ku Îro 800 malbatên koçber ên Efrînî ji herêma Cizîrê bi rê ketin û gihan bajarê xwe.

Efrîn 14 / 4 / 2026 Z - 2638 K

Nivîsgeha Ragihandina Navendî ya
Partiya Demoqrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê

Bendava Meydankê we silav dike

Rojnameya Pêşverû

Pêşverû

Siyasî . Çandî . Gîştî

Ev Rojname Rojnameya we ye
Ev Deng û Hawara we ye
Zengîn bikin bi gotarên xwe
Ev xewn û Hêviya me ye
Hişmend

E.Mail: altekedome-efrin@hotmail.com Facebook التقدمي عفرين